

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Bîrc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanî.

CENG & SIYASET DEWRAN

DEMÊN GIRAN

Şerê Dnieprê

Ordiya Sor di peravên Dnieprê de cih li elemana teng kiriye. Di dirêjahiya vî eniyê de — 1.700 kilometr — du milyon şerevanî bi çek û silêhên nû û nûjên, û bi arîkariya tang, top balafr, mitralyoz, agiravêj û qumbereavêjen çeperan — kes êdî qala tîfing û şerderban na ke — ketine sing û qirîqên hev û du.

Eleman bi qesda sekinandina êrîşa rûsî a xedar û bê-eman, bombeavêjen xwe û balafrên ko bi serîkî dirêjt neyarên xwe dikin, tînin qada şerî û tîxin qomandê.

Lê çekê rûsî ê hewayî bernade ko refên elemanî bigehin armancên xwe, pêşiya wan digirin û wê bela wêlî na dikin.

Leşkerên Rûsî

Kaspîane vegertine û gihane pêşiya Vitebskê.

Elemana bi qesda rakirina serpira rûsî a Perayasiyayê, bi arîkariya 80 tanga, 14 caran ber êrîs kirine; bîfeyde, Ūris pîdane erdê dora serpira xwe, piştî şke-nandina êrîşen elemanî; hêj firehtir û qaimtir kirine.

Di Nîro-Rohelatê

Kremençugê de gund û avahîgeh bi sedan ve ketine destê Ordiya Sor. Çeper û penahên elemana yê aliye Dniepropetrovskê di tengiyê de ne. Der khergirava Tamanê de, leşkerên rûsî, gihane peravên roavayî û niho li Erdê Qrimê dinêrin.

Êdî eşkere dibe ko pûk û badev, ba û baran, berf û qeşa ne xema Ordiya Sor e. Serfermandariya rûsî top û cebîlxane, zad û xwarin, hûr û mûrên eskerên xwe bi traktorên neqil dike, traktorên ko xema herf, riyên xirab û çem û robara naxwin, li ser wan re bê zehmet diborin û her tiştê ko hewce ye digehînin şerevanîyan.

Ji aliye din Serdariya Sovyetî di erdên nû vegirtî de, qerargehên xwe daniye, ew saz kiriye, pêk anîye û erdên piştaniyan de, her tişt bi rêz û tertîb çêdibe.

Kelêhên Gomel û Kiyevê dibin derbêh Ordiya Sor de dilerizîa,

Niho Gatinên

Generalê elemanî Dîtmâr û kapîtên Sertoriyus hêj çêtir tene seh kirin. Wan di Radyoa Berlînê de digot rojên hêj reşîr û girantîr bi ser me de bèn.

Di eniya Dnieprê de êrîşa difroka cihanê a mezintir çêdibe û bi çavsoyîya ko heta niha ne hatîye dîtin û bihistin.

Bombardimanên Dawîn

Refên Hevalbendan her car bi awakî hêj xurtîr bajar û qaristanên Germanîstanê bombardîman dikin.

GOMEL & KIYEV

Pêşveçûna Ordiya Sor a Brûskîn

MOSKÛ— Ordiya Sor gihaye pêşiya Gomel û Kiyevê.

LONDRE— Emîraliyên britanî û emîrkanî pev re danezanek belav kiriye; tede hatiye gotin: meha borî noqavên elemanî nikarî bûn waporekê me jî bin av bikin, li 29-ê flonê 15 noqavên elemanî dirêjt qefle waporekê me kirine û ji gemiyên ko ev qefle dihemandin sê heb û çend barkêş xeriqandine. Qiwetên me nivê noqavên dijminê şiyandine binê avê.

Her wekî her du emîralî dizanin ko elemana ji bona êrîşa noqavan î mezin haziriya xwe dikin, wan jî xwe pêk anîne û debarên ko hewce ne kirine.

LONDRE— General İker, lebatek ji çekê emîrkanî ê hewayî di Londrê de peyiviye û gotiye: Qesda me, û a refên britanî di zivîstana ko bê xirakirin, pelixandin û hilweşandina kar û barên elemana ên eskerî li pir û rê û rehîsin û trê û hêsincavên wan yê çûn û hatinê ye; heta ko dema vegirtina axa elemanan de xesarên me zehf ne bin.

KARDARIYEKE SOVYETI

A MEZIN JI 55 LEBATAN BIHEVKETI

LONDRE— Ūris zehf bala xwe didin civanê Hevalbendan ê Behra Spî; û ev tişt ji piraniya niûnendeyên ko dişînin Cezayirê xuya dibe. M. Bogomov yê ko fro wê bigehe Cezayirê, niûnendeyê Sovyetîstanê li ba Komîtê frensîzî a xelasiya welêt e; pê re 25 pispor û karker hene. Di wextekî nîzing de M. Vişînski wê bê Cezayirê; komî serê bi ser xistî yê wezaretê sovyetî ê dervekarîyê; ev serekê kardariya sovyetî ye, li civanê Behra Spî, ev kardarî jî 30 lebatan bihevketî ye. Bi vî awayî 55 niûnendeyên rûsî de bikevin Civanê Behr Spî.

6.000 BALAFIR

Di Nav Deh Mehan De û Bitenê L'Eniyekê

CEZAYIR—R: Ji wextê ko qiwetên Hevalbendan pê li erdê Efrîqa Bakurî kirine — 8-ê kanûna pêşîn 1942 — û heta niha, di eniya Behra Spî de 3.461 balafirên Mihwerê hatine avêtin erdê û 2.600 heb jî di dema pêşveçûna leşkerên Hevalbendan de, der balafirgehan hatine standin. 880 balafir li qerargehên talyanî, 600, li Tûnsê; û 1.100 li Sîcilyayê ketine destê Hevalbendan.

STOLA FRENSIZI

CEZAYIR— Emîral Lemoniye, serekê şerdariya behriya frensîzî, di civana rojnamevanan de gotiye: 300.000 ton mezin cengkeştiyên frensîzî û 53.000 deryavan fro di teniştê hevalbendan de, şerê dijminê dikin.

CEZAYIR— General Jiro di Oranê de çavê xwe li yekîneyên Ordiya frensîzî gerandiye û fro vegeriya Cezayirê.

MELBURN— Qerargeha Hevalbendan a mezin li Pesifika nîro roavayî dide zanîn: leşkerên emîrkanî Vila vegertiye.

Bremen, Emden, Munix, Frankfurt, Stuttgart Darmstadt, Hanovir, Berlîn û zehf bajarên elemanî ên din derbîne dijwar xwarine. Di şerê hewayî de, — şerê hewayî ê mezintir — bombeavêjen emîrkanî ên gir kelêhên Fîrok di ser Bremenê re 142 neçîrvanên elemanî xira kirine. Bi wan bombardîmana destgeh û febrîqeyên elemanî — can û qiweta şerî — xira dibin, stasyon û rehîsin dipelixin, bajar dişewetin, xelk bê ban û serban, bê cot û calebê dimînin, û dikevin bin lepê zivartî û perîşaniyê.

Di Pêşiya vî Halî De

Hitler dibêje xelkê xwe: Veger ne maye, çekê xwe xweş bigirin, xwe sist ne kin, divê em heta bihna dawîn şerê neyarên xwe bikin; an mirin an serfirazî.

Eniya Talyanî

Ordiya emîrkanî pînc, û ya britanî heşt di Voltorno û Termoliyê de serfiraz bûne.

Yekîneyên emîrkanî li ava Voltornoyê derbaz bûne û şerê Romayê destpê kiriye. Li Termoliyê, leşkerên General Montgomerî, zora elemana birine û hilkişiyane serê ciyayên talyanî. Pêşveçûna her du Ordiyan dom dike.

DANEZAN

LONDRE— Wezaretê britanî a hewayî dûhî êvarê elam daye. Muskitos û Bostonên me, elektrîk xaneyên erdê Frensê dane ber bomban. Refîne din li hêjagehên erdê Parîsê en eskerî xistine. Bîst neçîrvanên dijminê yê ko dikirin pêşbiriya refên me bikin hatine avêtin erdê.

Jê pê ve bombeavêjen me Tîfon, di penaha neçîrvanan de, der Fîlesîng, zora xwe dane çûn û hatina gemiyên dijminê. 4 bombeavêj û 9 neçîrvanên me venegeriya-ne warên xwe, lê du balafirvan di selametiye de ne.

Duhî di ser axa Frensê û Holendayê re 24 mekîneyên dijminê hatine xira kirin.

CEZAYIR— Radyoa Cezayirê bant xelkê Frensê dike û dibêje: Frensîzîno! dema azahî û serbestiya Welêt nîzing dibe; lê tiştîne giran hêj di pêşiya we de ne, divê hon roj berî rojekê jin û zaroyên xwe bişînin gundan, ava hîgehên dûrî bajarên mezin; û vî tiştî zû pêk bînin, ko carekî qewimî êdî rê pê na keve.

Qewil û Ayin

QEWILÊ PEXEMBER

Emê bêjin medhê resûl Yareb hêvya me bike qebûl Ko em di heşrê da ne bin zelûl Zelûl ne bin l' qiyametê Em jî tebayê Ometê Mihemed şefihê Ometê.

Roja heşrê rojek teng e Erd û ezman li me da deng e Li me gunehkara ne ma reng e Kes barê kes hilnagirê Ji xeynî Mihemed Mistefa.

Dinya bû heftî û du refa Xwezil bi sefa Mihemed teba.

QEWILÊ BER EREBANI

Tirba min î çend î dirêj e Marek tê de kher û gêj e Dayim dixwe goştê mirovê Tarik sela î benîmêj e.

Tirba min li nav tirba ye Dilopek tê ji jor de, Di nav çava ye.

Ev ezabekî pir giran e Ezabê de û bava ye.

SIH HEZAR

TON WAPOR HATINE XERIQANDIN

MOSKÛ— Di nav 8 rojên dawîn de qiwetên sovyetî di Behra Barentzê, û yê Baltîq û Reş de, 30.000 ton mezin waporen dijminê bin av kirine. Bi derbên Ūrisa du waporen banzînkêş 15.000 ton mezin, 21 barkêşên şet û robaran û 8 gemiyên din bin av bûne.

LONDRE— Hawîrên Londrê en agah niho bawer dikin ko Wezîrê emîrkanî ê dervekarîyê Mister Kordel Hal bi xwe, wê here Moskoyayê, ji bona civanê sêserî, civanê wezîrên britanî, rûsî û emîrkanî ên dervekarîyê.

WEŞINGTON— Ji Weşingtonê didin zanîn ko êrîşa erdê Ewrûpayê ê roavayî îsal wê çêbibe.

ROME MIRIYE PERIŞANIYA XELKÊ

STOKHOLM— Li ser rewîşa bajarê Romayê nûçegihayê rojname svêçî Gotborg Tidingen kiitkîten jêrin elam dide: Êvarê piştî saet nehan kes nikare ji mala xwe derkeve û kûçê ko lanan de bigere. Trê, tramway û otomobîl mîna adefî dimeşin, lê peyayên ko di nav bira 18 û 35 salî de ne qey wînda bûne. Ew hatine girtin û şiyandin İtalya Bakurî, ji bona xebata zor, ew rê û penahanê çêdikin Hin rojnameyên fasîst yê ko li 25 ê firmehê hati bûn sekinandin jî nû ve derdikevin, nemaze «Regima Fesîsta».

Polîsên talyanî ber nadin ko xelk bikevin Vatîkanê. Du nobetdarên elemanî silêh di dest de, meydana St. Pierî diparêzin.

LONDRE— Du waporen Svêçî a xaça sor 6.000 ton zad û zextre antne Selanîkê.

Svêçîstan pê arîkariya xelkê Yewnanîstanê dike. Du waporen din jî tèn Pirayê.

DEMA NIHA

CEZAYIR — Yekîneyên Hevalbendan ên mezin li ava Volturnoyê derbaz bûne û li wê aliyê avê serpirine qaim danîne. Qiwetên Ordiya pîncemîn ên zirhkîrî pêş ve dikewînin, her çend jî berberiya elemana xurt e. Şerê Romayê destpê kiriyê.

MOSKÛ — Bi awakî resmî didin zanîn ko leşkerên sovyetî di kûçê û kolanên bajarên de şerê elemana kirine, ew şkenandine û şarisianên Gomeî, Melîtopol û Zaporojîyê standine.

MELBURN — Hevalbendan dirêjî Rabûlê kirine û xesarine dijwar gihandine Japona. Zehf gemiyên Japonî hatine xeriqandin. Çekê Hevalbenda ê hewayî 177 balafirên Japonî anîne xwar.

CEZAYIR — Mareşal Badoglyo, serekê hikûmeta talyanî dubî bi bangina ko di radyoyê de hatiye belav kirin da zanîn ko Italyayê dest bi şerê elemana kiriyê. Ewe bangîn:

Italyanino! Ez ji we re didim zanîn ko min îro 13-ê çirîya pêşîn, bi emrê Kralê Italyayê şer îlanî elemana kiriyê. Beriya ko eskerê elemaniê dawîn ji Italyayê derkeve, silh û aştî na keve destê me. Divê emê di tenîştî hevalên xwe Emerîka, Brîtanîya Mezin, Rûsyê û mîletên Hevalbend ên din de pêş ve herin.

LONDRE — Hikûmetên Brîtanîya Mezin, Emerîka û Sovyetîstanê bi gotareke yekdemîn elam dane ko wan qerara hikûmeta talyanî cem xwe nivîsandine, qerara ko bi gotinên Mareşal Badoglyo hatiye wesif kirin. Ew tevkariya qiwetên talyanî ên çek-kîrî dipejirînin, û kirina şerê elemana de Italyayê mîna nîvekarê şerker nas dikin. Lêbelê bi vevkariyê şertên çekdanîna talyanî bi tu awayî ji qiwet nakevin. Ev şertên he bitenê bi lihew hatina Hevalbendan û li gora arîkariya ko talyana kirine, dikarin bêne edilandin.

TEMO & ÇELENĞ

- 2 -

Bi vî awayî demeke mezin bo- rî, Rûstemxan û jîna xwe li halê keça xwe ecêb mayî man, keç jî roj bi roj, saet bi saet, jar dibû, û goştê wê her wekî herfa li ber tavê dihelya. Her gav ewê ji bihn tengiyê gazind dikir û digote dê û bavê xwe; ji günd pê ve li tu cihî ez dil fireh nabim... de Bavo, de Dayê, rabin em derkevin gund. Dê û bavê wê, ber delaiya wan jê ra, bi a wê dikirin, çima ko ji Çelengê pêva tu zarokên wan tu ne bûn. Radibîne bi tevayî dicûn gund, du, sê şevan dişkênandin. Çelengê bi dîzî Temo didît û her duwa, bi dîtina çavan pêta di dilê xwe da vedimirandin.

Rojekê Rûstemxan ji jî, na xwe re got: hurmet! hela binêre bê çî halê Çelengê ye? û daxwaza wê çiyê? Dêya wê buhurt cem wê û bi nermî jê pîrs kir û gotê: Çeleng! Keça min a delal, tu xêr e, çî dixwazi? qîzê lê vegerand, dîsan û dîsan jê pîrskir, Çeleng, serê xwe nizim kir û kelo-grî bû û lê vegerand: Dayê, Dayê, min Temo divêt, Temoyê gundî. Dê ji bavê re dilxwaza wê qisekir. Bav enîrî, heç bû, û bi lez bi ser qîzê da hat û qîrî: keça xirab, tu çawan dildîki gundiyeke belengaz bikî? Keçikê ruyê xwe ji bavê zîvirand û bê hemdê wê hêstîrên germ di çavan de çûn û hatin û ji nav bijankên dirêj gundîrîn...

Bawê wê, careke din, bi dengê xîzî û bê rehîm li wê qîrûja: vegerîne qîza xirab. Çeleng berî xwe da bavê xwe û li çavên wî nihîrî û bi dengê dil qîskîstî jê hêvî kir û gotê: Bavo, ez heyran, belê Temo gundiyeke belengaz e, lê belê, dilpaqij û çavtêr e; yan Temo Bavo, yan ez mêran nakin. Bavê wê lê vegerand: te didim Ruhîstîfî û nadim Temoyê gundî, welê keç bimîne heya mirinê, û Çeleng hîştî û bi derket.

Şeş heft meh borî, rojekê êvarê, Rûstemxan li gundê xwe, di nav mêvan û gundiyan xwe da rûniştî bû, ji pêşberê gund gaziyek bihîstin: nêrîn ko wayê şivanek dibêje: «çar leşkerên hikûmetê tev serekê wan ve hevalê min kuştî û keriyê me dan ber talanê,

ez bi zora lîngan fîlîtm û hatime hawarê. Temo berî hemûwan hespê xwe şidand, û dest da tifangê û hefsarê hespê xwe berda û çû.

Temo li piştî neyar ket, ge heştê wan, hê talan bi dîr ne xistibûn, peya bû, xwe avête piştî zinarekî, û deng da leşker û qîrî: gellî neyaran, berê xwe bi min din, qet mebjîn ko Temo bi bêbextî hate me; û qîrî wan kir, tiqereqekî piçûk borî, cendekên sisêyan ji wan leşkeran di nav xwîne de man û ên mayî talan berdand û bazdan. Temo ji paş zîner hate xwar, berê xwe da wan cendekên ko li erdê mabûn, dît ko hej ruh di sînga serek de hildavêt, û çavên wî hê bi girtina dawîn ne hatine. girtin, Temo li ber laşê wî sekînî û gat ê: (erê ... gerek hon bizanîbin ko xwîna mirovekî kurd bi pênc qurbanan tete birin).

Temo keriyê pêz da hev, û her ve gund ajot, di rê de, dît ko waye ji nû ve siwarên gaziyê tîn, jê pîrs kirin; kuro Temo te çikîr? Temo li wan vegerand û got: ve gerin gelê gundiyan, îş qediya. Hemû li dora wî top bûn û ew bi gabaş û gahîneteke mezin derbas kirin gund.

Rûstemxan dongê qire cirê bihîst, ji xulaman salix hilanî. Dema ko seh kir ko ew xortê wê talan vegerandine bi navê Temo ye, kete bîra wî ko ew kesê ko Çelengê lê dilxweş e.

Xortan, Temo di nav xwe de yekser anîn mala Rûstem. Rûstemxan heya pêş derî, çû pişgiya wî, deste wî bi germî hejand, enfî ya wî bi dilovanî maç kir û gote wî: her bijî mîrxas ol her bijî egîdê xortan.

Rûstemxan bi destê Temo girt û borand hela malê, bangkir keça xwe, Çeleng hat, bavê wî destê wê û Temo gihan de hev û bi çavekî nêrîn-qa li wan nêrî û got: hûn ji hev pîroz bin, u bi hev ra kal a pîr bibin.

Piştî heftêkê, dawetê mezin li gund çêdibû, bûk û zava. bi benê miqedes dibûn yek, bi dilekî geş, gava peşîn avêtin, û bi riya jiyînê ketin...

SUBHIYÊ DIYARBEKÎ

MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WENEYÊN ŞER Û AŞTIYÊ

Kebat - Hejabûn - Serfirazî



Pisporên Emerîkanî Qala Selihandin û Edilandina Balafiran Dikin. Mirovên Heja Bi Tîştê Ko Kirine Qet Qail Na Bin, Dixwazin Her Bêtir û Çêtir Çekin.



Qeflewaporeke Mezin Gihaye Bendereke Brîtanî. Hevalbendan Zora Noqavên Elemani Birine û Behrên Cihanê Ji Nû Ve Bûne Serbest.



Qiwetên Çînî Ên Motorkîrî Berê Xwe Dane Dijmîna. Welat-perwerên Çînî Bi Mîraniyê Ecêb Şerê Japona Dikin û Ji Bona Azahl û Serbestiya Welatê Xwe Dixebitin.

LI BER DERGÛŞA

L O R I

Lorî de lorî
Kara min de lorî
Berxa min de lorî...
Hekîmo, hekimê Helebê
Tu bîne derman û elbik û melhemê
Birîna xortê mala bavê min
Pîr xedar e;
Şaxê xwe berdane ser kezebê.
Lo... hekimî... hekimê zozana
Tu bîne elbik û dermana
Birîna xortê mala bavê min
Pîrî xedar e...

Ez bala xwe didimê
Zenga mirinê avêtiye dirana
De lorî, kara min de lorî
Dergûşa kara min ji darê lûle ye
Ezê tê wer kim kurk û ebe ye
Ezê berxa xwe, li nav piştî xwe bigidînim;
Ezê bibim mala bavê xwe ye...
De lorî, karika min de lorî!...
Dergûşa karika min, ji darê gwîzê
Ezê pê werkim bihna misk û mawerdê
De lorî karika min de lorî...
XELÎLÊ METÎNÎ

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

C'est sur le cours moyen du Dniepr qu'est en train de se décider la plus dure partie de cette campagne. Les Russes sont parvenus à transférer plus d'une dizaine de divisions sur la rive occidentale du fleuve, au nord et au sud de Kiev. Toutes ces troupes soviétiques ont réussi à emporter avec elles une puissante artillerie et tout leur matériel lourd. Plusieurs contre-attaques allemandes désespérées ont été repoussées avec succès et les unités de l'Armée Rouge opérant sur la rive droite du Dniepr tant au nord de Kiev, au confluent du Pripet, qu'à une soixantaine de kms au sud de la capitale de l'Ukraine sont à plus de 16 kms. à l'ouest du fleuve, de sorte que la berge où s'effectue constamment le débarquement de renforts est déjà hors de portée de l'artillerie ennemie.

La percée de la ligne du Dniepr est lourde de conséquences pour l'armée allemande. Les unités soviétiques menacent maintenant de couper du gros de leurs forces les effectifs allemands opérant encore dans la boucle du fleuve, ce qui représenterait pour la Wehrmacht un second Stalingrad.

Seule une retraite hâtive pourrait encore sauver les armées allemandes mais comment concilier cette retraite avec le maintien du prestige du Führer et ses déclarations concernant la ligne de défense du Dniepr? Surtout que des questions d'ordre économique viennent en core se greffer par-dessus. Après la perte du Kouban, du Donetz et de la majeure partie de l'Ukraine il est essentiel pour les Allemands de conserver tout au moins une partie de ces riches terres à céréales.

En outre, plus les Russes avancent, plus ils se rapprochent des frontières de Roumanie, et le moment n'est plus éloigné où les champs pétrolifères de Ploesti se trouveront dans le rayon d'action des bombardiers soviétiques.

À tous ces facteurs viennent s'ajouter des raisons politiques: la situation devient de plus en plus difficile pour les Allemands en Roumanie et en Bulgarie et l'attitude de ces deux pays est profondément influencée par l'avance russe vers l'Ouest.

L'armée allemande du sud se compose de 7 divisions cuirassées et de 14 divisions d'infanterie qui pour la plupart, ne possèdent plus leurs effectifs de campagne, ayant été constamment sur la brèche depuis plusieurs mois. Ces divisions ennemies ont un besoin urgent de renfort et de matériel blindé qui

LA LITTÉRATURE COMME BASE

DE LA VIE NATIONALE

UN ESSAI SUR LA LITTÉRATURE TCHÉCOSLOVAQUE

Par V. ALES

Franz Sramek lire: Franza Chramek éternellement jeune même à l'âge très mûr, forme la transition moyenne à la période la plus moderne. C'est là l'ère des auteurs qui ont activement participé à la lutte de la libération nationale du peuple tchécoslovaque et à la construction de son Etat renouvelé. Ils sont responsables de l'épanouissement splendide de la littérature tchécoslovaque ou cours de la période de la libre République tchécoslovaque depuis 1918.

La prose et le drame de cette période sont représentés avant tout par Karel Capek (lire: Tcapèk; né en 1890, mort de chagrin après le désastre minicois de sa nation en 1938), dont l'œuvre, poétique et philosophique en même temps, a gagné une renommée mondiale. Parmi les autres prosateurs de cette période, signalons au moins deux connus: Ivan Olbracht (lire: Olbrakhl; né en 1881, mort dans un camp de concentration allemand) maître de la description de la Russie Subcarpathique, la partie la plus orientale-belle et romantique de la Tchécoslovaquie; Vladislav Vanoura (lire: Vladislav Vančoura; né en 1891, exécuté par les Allemands), le maître du roman; et l'un des plus jeunes. Egon Hostovsky (vivant actuellement en exil). Avant de finir ce chapitre sur la prose des dernières années, il serait injuste d'oublier la prose satirique qui a donné à la littérature tchèque son titre le plus populaire à l'étranger: «Le bon soldat Svejk» (lire: Chvejk), par Jaroslav Hasek (lire: Yoroslav Hachèk; 1884-1923) une satire rigoureuse et démocratique du militarisme austro-allemand de la première guerre mondiale.

Le développement de la poésie n'était pas moins splendide. Des poètes de la plus

le Commandement allemand ne peut leur fournir qu'en les prélevant sur d'autres secteurs de l'immense front oriental, ce qui, d'ailleurs, a déjà été fait à Nevel, par exemple avec pour conséquence immédiate la percée russe dans ce secteur.

Cette percée a pour effet, non seulement de rapprocher les unités soviétiques des frontières de Pologne et des Etats Baltes, mais aussi de menacer toutes les positions allemandes du front de Lenin grad.

Là aussi, l'armée du général Kiehler se trouve sous la menace d'une catastrophe, en cas d'accroissement de l'avance soviétique, mais une retraite allemande sur ce front entraînerait également de graves répercussions d'ordre politique.

Toute la Russie septentrionale serait libérée. L'Armée Rouge parviendrait aux portes de la Prusse orientale. La Finlande n'aurait plus d'autres ressources que de demander la paix et l'armée du Général Dietel opérant dans les régions arctiques, serait complètement coupée de tout moyen de communication avec le Reich.

Une tentative de résistance de la Wehrmacht sur la ligne du Dniepr équivaut à une catastrophe militaire; une retraite vers l'ouest représenterait une catastrophe politique et économique pour le Reich.

Les dernières nouvelles du front italien indiquent que les armées alliées

vieille génération citons au moins Otaka Brezina (lire: Brjézina; 1868-1929), un poète de mysticisme religieux, de renommée mondiale. Le lyrique de la délicatesse d'un Villon et d'un Verlaine; Karel Tomán (né en 1877) appartient à peu à la génération la plus jeune — moins par son âge, que par son attitude littéraire. Le même caractère distingue le poète socialiste et révolutionnaire St. K. Neuman (lire: Noimann; né en 1875).

La poésie publiée immédiatement après la première guerre mondiale, exprime les sentiments éternels de la nation; le désir de la fraternité et de l'égalité des hommes; Le lyrique Josef (lire: Yosef) Hora (né en 1891) est souvent considéré comme le plus grand des poètes tchèques vivants, tandis que Jiri (lire: Yirji) Wolker (1900-1924), prématurément mort, devint le maître de la ballade humanitaire. Les tendances ultra-modernes de la poésie sont représentées surtout par F. Halas et V. Neval (né en 1900).

Il faut encore traiter la littérature slovaque. Une production littéraire slovaque séparée n'a commencé que vers la moitié du XIX^e siècle, quand le philologue et patriote Ludevít Štur (lire: Loudévít Ctour; 1815-1856) éleva le dialecte slovaque en langue littéraire, afin de pouvoir mieux sauver le peuple d'une magyarisation complète. À ce temps-là, le peuple tchécoslovaque vivait toujours sous le joug des Habsbourgs. Mais tandis que la branche tchèque du peuple souffrait sous l'oppression allemande, dans la partie autrichienne de la Monarchie habsbourgeoise, la branche slovaque était exposée à une tyrannie encore beaucoup plus cruelle des Hongrois, dans la partie hongroise de l'empire des Habsbourgs. C'étaient ces raisons politiques qui

sont à la veille de déclencher une poussée générale en direction de Rome. Le Commandement Allié s'attend à livrer encore plusieurs combats avant d'atteindre la capitale, mais toutes les dispositions ont été prises pour assurer le succès de ces opérations.

Kesselring met en ligne tous ses chars, ses canons et ses avions disponibles pour contenir la poussée alliée, mais on apprend que la 8^e Armée a reçu des renforts considérables, débarqués sous la protection de la Marine. Les Alliés semblent avoir l'intention de poursuivre leur avance sur la ligne allant de Benvenuto à la côte.

Les Allemands prétendent que les Alliés disposent déjà de 15 divisions dans le sud de l'Italie.

En Yougoslavie, les unités de partisans poursuivent avec succès leurs opérations dans les régions de Zara, Sussag, Karlovak, Ogulin et de Varazdin. L'importante gare d'embranchement de Vargovac, située sur la voie ferrée Budapest-Zagreb, non loin de la frontière hongroise, a été détruite par un détachement de patriotes. La majeure partie de la ligne entre Zagreb et Korpivnica est actuellement aux mains des partisans.

En Istrie, la bataille se livre principalement dans les environs même de Trieste. Les Allemands se sont retirés vers le port.

Th. H.

POÈME KURDE

FUREUR

Le soleil est un point mort
Dans l'espace vide
Quand la trombe arrache
Les branches
Des arbres,
Comme des femmes malheureuses
Leurs cheveux.

Des abîmes s'ouvrent
Entre le ciel et la terre,
Comme un cauchemar
Le vent est noir,
Les nuages ont des lèvres rouges
Qui bruient sous leurs baisers
Les entrailles de la terre.

Un cri terrible parcourt
Les cimes des montagnes,
Des avalanches tombent
Comme une clameur qui arrive
Du fond d'une catacombe.

Comme un mot
Qui détruit le rêve
Ou l'amour d'une vie.
Cette fureur sauvage est douce
Comme le sang qui coule
D'une blessure

Et chauffe des muscles gelés
Comme des héros qui
Sous leur lance de courage
Dominent des dragons en rages
Les rochers regardent
Ce tumulte farouche
Sans dire un mot,
Sans ouvrir la bouche.

Dans l'horizon lointain
Soudain
Le soleil ouvre son œuil
Des flèches dorées couvrent la terre
Des feuilles sanglants
Brillent comme des flammes;

Mais la brise
Est douce
Comme la caresse d'une femme,

DR. BEDIR KHAN

ont causé la séparation de la langue littéraire et de la littérature slovaque et qui étaient également responsables du fait que le développement de cette littérature nouvelle n'était aussi rapide que celui de la littérature tchèque.

Le premier grand poète écrivant en slovaque, était Hvie-doslav (lire: Hvièzdoslav; 1849-1921), le premier grand prosateur était Martin Kukučín (lire: Martyligne Koukouchine; 1860-1928), le Gogol slovaque. Un autre poète et prosateur excellent était Martin Razus (lire: Martyligne Razouss; 1888-1932) qui était, en même temps, l'un des chefs politiques de son peuple.

Or, ce n'était qu'au début de la vie nationale libre dans la République tchécoslovaque, qu'on pouvait remarquer un véritable épanouissement de la littérature slovaque. Parmi les auteurs de cette période signalons au moins Jan Smrek (lire: Yan Smrèk; né en 1895), le premier romancier slovaque à être traduit en langues étrangères,

L'espace limité d'un article journalistique ne nous permet pas de décrire le développement de la littérature tchécoslovaque dans ses traits les plus caractéristiques et de mentionner que des auteurs les plus importants. Nous aurons d'ailleurs l'occasion de publier quelques belles pièces de la littérature moderne tchécoslovaque en traduction. Or, même ce bref essai doit donner au lecteur au moins une impression fugitive de l'effort littéraire splendide d'une nation, petite numériquement, mais importante quant à son moral et à son zèle culturel, d'une nation qui a construit toute sa vie sociale et politique sur la base spirituelle de l'humanisme et de la démocratie véritables.

Prochainement, LE JOUR NOUVEAU paraît chaque Lundi.

DI WELATÉ ZEMBEQÉ GEWIR DE

Nivisevan

Grigori Petrof

15

Wergandok:

Qedrl Can

FOTBAL

Ji pişti ranişta Napolyon li ser textê Frensa ve, li Ewripayê ceng ne sekint bû. Napolyon hema bi Ewripayê giş re ceng dikir; herî gişan dixwest Ingiltzan bişikne. Ingiltzan jî dixwestin wî jî textê wî daxfinin. Napolyon Ūris jî bi cengê dida tirsandin.

Ūris, ji ber vê tirsê, di sala 1.808 de, dev ji şerê xwe û İşweçê berda... ew şerê mezîna û bi nav ū deng, di nav Frensiz ū Ūris de çebû. Napolyon quweta bîst miletî civand ū ajot ser Ūris; heta Mosqwayê çû... Le li vir şikest ū di şînga Ūris de serê wî peçiqî... bê tab ū tewan veşeriya Fransayê. Ji bo veşerandina nav ū dengê bert, xebitî... lê vê car Ingiltz, hemî Ewripa jî xwe re kirin hevalbend ū ajotin ser Napolyon; Napolyon dîl ket... ū nefiyê (Saint Héléne) ê bû.

Ewripayên ku ji şerê Napolyon bêtab ū bêzar mabûn, jî vê serencama Napolyon gelek dîlxweş bûbûn ū jî xurtbûn ū serdestiya ingiltzan pîresteskar mabûn. Wan jî dixwestin Ingiltzan textîft bikin. Edî her karê Ingiltzan bûbû adet ū moda.

Zaroyên biçûk, carna adetên ne qeşç, jî mezînan digirin; mîna vexwarina cixarê ū araşê ū bi dengê bilind peyivîn...

Miletê ku bi ilm ū İrfan kêma mabûn, jî Ingiltzan hinek adetên kirêt girtin.

Merivên hal ū wextê wan baş, zengin, mîna Ingiltzan, jî bona cîrda hespan pere ên pir xere kirin... mîna Ingiltzan soda ū wis-

ki vexwarin.. mîna wan serê xwe kurkirin ū şekirîn.

Xortan, jî Ingiltzan adeta foîholê girtin... Ew xortên ku hêj xwendina xwe ne qedandi bûn, jî lîska fotbolê re pîrestesg kirin... ū fotbol jî kirin mîna ilm ū sen'etkî... Ew nivîsevanên ku serê wan vala, ku tenê dikarin xelkê koçeyan bînin heyecanê, di rojameyên xwe de, jî bo fotbolê bendek vekirin ū tede behsa rindbûna çîpên stûr, mîna çîpên gamêşan kirin.

Di zemanê (Senelman) de, li Finlanda jî ev hewes çebûbû. Hingî, di xortên Fin de şkrên durust pêda ne dibûn, ū hêj bi şkrên durust re bendewar ne dibûn. Pişti ku Finlanda, xwe da ser Rûsyayê, di nav xortên Fin de, hisên heyf—stendîna jî İşweçan, kêma bûbû. Xortê Finlanda êa serî vala ū tiral xwe da bûn fotbolê, mîna nexweşiyêke zirav, di nav xortên b a j a r a n de, digeriya... heta xwe avêtibû nav gundên mezîna jî... Civat ū bange (nadf) yên fotbolê, mîna pizikên canekî nexweş... mîna pêşiyê çiravan pir bûbûn, çîpên—mîna çîpên gamêşan—stûr şayanê sitayîşan bûn.

Senelman ū hevalên wî ne dixwestin li şûna serê mezîna çîpên stûr çî bigirin... wan ne dixwestin ku quweta serî bikeve lîngan ū serî vala bîmîne. Her çî ku pêşveçûn ū bilindbûna Finlandayê dixwestin digotin:

Ji çîp ū zendên mîna qayîqê sert, çî derdikeve? Ji bona welat çî xebatê karin bikin?

DÛRIK

DÛRIKA DANKUTAN

Hey yal- la, ya—la
Yek wê hayê

Li nav rezayê
Kil ū mirêk
Li ser çoşayê
Bîşkê sor beradayê
Çavê reş in kil didayê
Kil ū mirêk l'ser qabayê.

Ez diçûmê
Ew rewiyyayê
Ez gîhamê
Mirêk bi cart
Li erdê dayê.

Carâ cara
Li Sundayê
Ū li mandelayê
Ū min ne diyê
Ū min ne bînayê
Ha ū elmê min
Ne gîhayê.

Ev hêlinê qaz ū beta
Hêlin çêkir çol ū weta
Ū l' ser haleta
Vê payizê xew xweş bûye
Li paşîla van hurmeta
Ev hêlinê van İtîiya
Hêlin çêkir çol ū çiya
Ū l' ser deviya.

Gelî xorta vê payizê
Berî sibê
Xew xweş bûye li paşîlê,
Van esmera, van zeriya.

Lê, lê Eysê, Eysa xanê
T' bîlxur bîne jî hebanê
Kevçiya bîne, j' keşîdanê
Tu rûn lêke jî xîzanê.

Heçî xortên dankutanê
Bîla bîxwin, nûşecanê.

Li pîreka ū l'jinbiya
ū li di hinbera
Bi quzulkurt ū zexferanê
Çî werîsê girê girê
mi avêtê qulpa pirê
Ez xulama qantircikê
du qantirê.

Siwarê kerê
Li ser benderê,
Çav li derê
Wek ê gerê.

Ehmed kurd e
Çî qaf gird e
Mala Ehmed
Perê gund e
Jinka Ehmed
Çîqas rind e.

Zîqaqa reza bi kelbeş e
Ji İro pê ve gelî xorta
Çilovaniya, êzingvaniya
Weşê weş e
Civana min ū xelka delal
tata reş e.

Way ohyayê, çî dîlxweş e
Hêy yal—lah l'exin şer e
Tu ne lal, tu ne kher
Li ber mîkutê xwe binê e.

Çî ewrî di ser me re
Sozê mi bi qerara te re
Lê keçikê çardesalt
Hewşa bavî, xwe dimall
Keçik çûye mal ma xalf


Ez çûm Kercewzê
Sê kanî ne
Yeke tehl e, yeke şor e
Ū yek şîrîn e.

Xwezî bi dilê wî lawikî
Navê dosta wî Emîne
Navê şîrîn ê xelkê tehl e
Ū bi min şîrîn e.


PÛJINËN DINYAYÊ
CENG & BIHINGEH




General De Gol, Destê Maqîlên Dirziyan Digiweşê.



Vedeteke Britanî a Torpîlavêj. Ev Gemiyên He Gelek Lez in ū Bi torpîlan Zora Xwe Didin Waporên Neyaran.



Topçiyekî Britanî Gulleyê Topên Xwe Bi Tîpê «V» Serfirazi Xemilandine.



Karxaneke Ewîstrali Yên Top ū Çekên Giran.